

Kurmandji

DANEZANA GERDÛNÎ YA MAFÊN MIROVAN

Di sala 1948 da hatîye pejirandin

- Herkes; Xwedê ci najat, cinsîyet, ziman, ol, ramanên sîyasî an yê din dibe bila bibe xwedê mafê wekhev e. Hemo mirov, ji kîjan netew anjî ji kîjan tebeqa civakî tên bila bîn, bêko mirov tu cudahîya zayînî anjî tu cudahîya din bike navbera wan xwedê mafên wekhev û azadin.
- Jîyan kirin, azadî û ewlekarîya şexsî mafê herkesîye.
- Divê li tu kesî iskence neyê kirin û li tu kesî muameleya derveyî mirovatî û cezayeke hizra mirov dişikîne neyê dayîn.
- Jin û mêr yên ku temenê wan gihaştîye dema zewacê bê ku tu astengîya netewî, olî û cinsî hebe mafê wan heye ku bizewicin û aîlekî biafirînin. Jin û mêr di berdewamkirin û xirakirina zewacêda xwedê mafên wekhevin.
- Her mirov xwedê mafê azadîya raman, wijdan û olî ye. Gora vê yekê herkes dikare ola xwe anjî bawerîya xwe biguhere.
- Herkes di bîr û bawerîya xweda azad e û maf heye ku vê yekê bîne ziman.
- Herkes xwedê mafe ku ji xwera karekî peydake, karê xwe bi xwe hilbijêre, herweha maf heye ku doza şert û mercên xebata adilane û tedbîrên dij bêkarî bik e.
- Mafê herkesî heye ku here dibistanê ango perwerde bibîne. Divê amanca perwerdê pêşxistina şexsîyetek azad û bihêzkirina îhtiram girtin ji maf û azadîya mirovan be.
- Herkes li hember civakê xwedê erk e.

DANEZANA JI HOLÊ RAKIRINA CUDAHÎYÊN HEMBER JINAN

Di sala 1979 da hatîye qebulkirin

- Jin xwedê hemo mafên mirovanên û divê bikaribin ev mafana bikarbînin.
- Dê û bav tevde ji zarokên xwe berpîrsîyarin.
- Divê yasa û zagon mafê jinan û wekhevîya jin û mêran garantî bik e.
- Eger hedefa cudahîya dembihûrî ya pozîtîf wekhevîya jin û mêran be ev yek dikare were qebûl kirin.
- Divê jin di dengdana hilbijartinên giştîda, di meqamên bilind, sazî û dezgehên navnetewîda wezîfe girtin û di tespîtkirina sîyaseta welatêda bi mêranva xwedê îmkânên wekhev bin.
- Divê tedbîr werin standin da ku libatên qalibgirtî yên jin û mêran werin guhertin. Rolên jin û mêr yên qalibgirtî, edet û kevneşopên ku jek cinsê yê din biçûktir anjî kêmtir dibînin herweha pêşdarazî ji holê were rakirin.
- Divê jin hemwelatî stendin, guhertin û hemwelatî parastinêde xwedê mafê wekhev be. Divê jin bi zor û zextê, bi rîya zewacê neye mecbûrkirin daku hemwelatîya mêrê xwe qebûl bike.
- Divê zarok bi otomatîkî nebin hemwelatîyê bav.
- Jin perwerde dîtin, xwendina dibistana bilind û di bazara karêda xwedê mafê wekhev e.
- Divê li mal û jîyana îş da li hember libatên cinsî yên qalibgirtî tedbîr werin stendin. Divê di naveroka pirtûkên ku li dibistanan tên xwendina agahîyên ku rolên cinsî yên kilasîk xort dikin tunebin. Beravajo, divê ev agahîyan handêrin daku cinsîyeta mirov çî dibe bila bibe bikaribe îşek yanjî perwerdeyek bi xwe dixwaze bi destxîne.
- Mafê jinan heye ku ji xwera bi şiklekî azad pêşeyek hilbijêrin, bergîdana xebatekî wekhevde destmizek wekhev bistînin û xwedê ewlekarîya sosyal, îş û aîle û maf hebe ku ji banqê anjî ji dereke din krêdî bistînin.
- Nabe ku jin jiber sedema ducanîbûn anjî jiberko xwedê zarokane ji kar were derxistin.
- Divê civak îmkan û derfetên sosyal avabike daku jin bikaribe tevlê jîyana giştî be û bikaribe jîyana malbatî û yê kar tevde bimeşîne.
- Jin maf heye ku ji îmkânên tenduristî sûd werbigre û bixwe biryar dide ku zarok çêke yan na.
- Jin li hember yasa (zagon) û dadgeha xwedê mafê wekhevên.
- Mafê jin heye ku bibe xwedê milk û ev maf nayê sînorkirin.
- Mafê jin heye ku azad tevbigere û li kuderê bixwaze li wêderê jîyana xwe bidomîne.
- Mafê jin heye ku bizewice, mêrê xwe bi xwe hilbijêre. Herweha di nav zewacêda û dema hev û du berdanêda xwedê mafê wekhev e.
- Jin, di wesayet, welayeta zarokan stendinêde û ji xwera ewlat kirinde xwedê mafê wekhev e.
- Jin, ji xwera paşnav hilbijartinêde xwedê mafê wekhev e.

DANEZANA MAFÊN ZAROKAN

Di sala 1989 da hatîye pejirandin

- Li Swêd kesên temenê wan di bin 18 salî wek zarok tên hesibandin.
- Zarok xwedê mafê jîyanê ye. Di hemû hewldanên derheqê zarokda divê mafê zarok werin parastin.
- Mafê zarok heye ku dema çavên xwe li dinyayê vekir navekî were lêkirin. Herweha mafê zarok heye ku bibe xwedê hemwelatîyek, dê û bavê xwe nasbike û ji hêla dê û bavê xweve were xwedîkirin.
- Eger zarok nexwaze kes nikare ji dê û bav biqetîne.
- Di rewşeke mecbûrîda, eger menfeta zarok têda hebe, wek mînak tecawuz anjî mameleyek xirab li zarok were kirin anjî eger di û bav ji hev veqetyabin û divê yek biryar bistîne daku zarok li gel kî bimîne wê hingê zarok dikare ji dê û bav were stendin.
- Eger dê û bav ji hev û du berdabin û ji bona zarok tu xeterî têda tunebe wê hingê mafê zarok heye ku têkilî bi her du alîra dayne.
- Nabeku tu kes bê destur zarok bibe welatekî din û li wêderê bihêle.
- Zarok xwedê mafek ku fikrê wî yên sebixwe hebin û di hemo mijarên ku wî eleqeder dikinda fikr û ramanên xwe bi serbest bîne ziman. Lê divê temenê zarok û gihîştîbûna wî were berçav girtin.
- Zarok xwedê azadîya olî û wicdanîye û divê ji vê yekîra îhtîram were nîşandan.
- Divê li jîyana zarok ya aîlewî û şaxsî mudaheleyên keyfi û bê qanûnî neyên kirin.
- Divê zarok li dijê tundî (şidet) ya fîzîkî û psîkolojîk, suîstîmal, lêdan û şideta cinsî bi tebîrên îdarî, sosyal û yasayî were parastin.
- Zarokên ku ji dê û bavê xwe bi demborî anjî bi berdewamî veqetyane mafên wan heye ku ji hêla civakê alîkarî bistînin û werin parastin. Dema ev alîkarî tê dayîn, divê taybetmendiyên zarok yên ziman, kulturî, olî û netewî werin berçav girtin.
- Zarokên ku seqetîya (mivro) wan ya fîzîkî anjî psîkolojîk hene, wek herkesî xwedê mafên ku jîyanek rêzdar, bêkemasî û bi rûmet derbaz kin.
- Mafê zarokan heye ku ji xizmetên tenduristî, yên tedawîkirinê û yên ewlekariya sosyal sûd wergirin.
- Divê zarok bi kevneşopîyên ku zerar dide wê/wî re neyê rûbe rû hiştin.
- Mafê zarokan yê perwerde heye. Divê amanca perwerde pêşxistina hûnerwertî ya fîzîkî, psîkolojîk û pêşxistina şexsiyeta zarok be. Divê perwerde, zarok fêrê rêzgirtin li hember nasnameya kulturê dê û bav û herweha rêzgirtin li kultur û nirxên biyanî bik e.
- Mafê zarok heye ku lehîstok bilehîze û beşdarê çalakîyên hûnerî û kulturî yên ku li gor temenê wê/wî ne bibe.
- Nabe ku zarok were revandin, firotan anjî bikaranîn awayekî zerar dide zarok.

" Tu kultur, tu ol, tu nirxên darêzandinê nikare çewsandina (tehdê lê kirin) jinan mezûr bide nîşandan.

Tu kultur, tu ol, tu nirxên darêzandinê nikare pêşîgirtina keçek ciwan, ku dixwaze bi xwe qerar bide û jîyanek serbixwe bidomîne, mezûr bide nîşandan."

Mona Sahlin

Kurmandji



Ji sê nivîsarên navnetewî yên

YEKITÎYA NETEWAN

Hatîye wergirtin:*

- Danezana gerdûnî ya mafên mirovan
- Danezana ji holê rakirina cûdahîyên hember jinan
- Danezana mafên zarokan

Kesên ku ji nivîsara resen (orijînal) wergirtîye û hazirkirin e:
Simone Lindsten, Länsstyrelsen Västra Götalands län

Werger:



LÄNSSTYRELSEN
VÄSTRA GÖTALANDS LÄN

Ji bo xwendina temamê nivîsaran li vê malperê binêrin, www.humanrights.se